

15. Juli 1992

Birayê hêja ez pir kêfxweş gava min tu li bajarê berlinê dît. Pir caran min ji xwe dipirsî, ma gelo carekê emê bikaribin hev li vî bajara hanê carek ji caran hev bibînin. Dunya mîna gundekî biçûk bûye. Pir caran mero xwe li cihekî dibîne, ku bi ratî ew cihê hanê nayê ser bal mero. Wehajî bi vî rengê hanê me hevdû li bajarê Berlinê hevdû dît. Pir caran mero ji dide pirsîn, magelo wê kenkî Kurdistana meyî ciwan û şêrîn mîna Dewletekê di vê dunya henê de bête dîtîn û peydakirin?

Pir caran me ji xwe re digot: Welat Kurd dê ew jî ji bin destê Turk, Ereb û bête derketin û ew dê bête rizgarkirin. Ji me dixwest em ji bona azadîya xwe bidin xwebat û têkşîn.

Ji bona te ez nameyekê didim nivîsandin ez dizanim. ku ev na meya ji bona pir dilxeşiyekê çêdike. Her wehajî ez bawerim, nivîsandina nameyên wisa pir bi sûd û qazancin, Pir Kes ji xwe dipirsin, bê çima tanî niha Kurdistan nehatîye azadkirin. Ew hoyê vê destana hanê di çiya, ziyar û dolên Kurdistanê de di - bînin. Êz gûmandikin, ku hoyê nebûna dewleteke Kurd tanî niha ew jî ji ber berzbûna çiya û zinarên Kurdistanê bûn. ev rastîya hanê pir ji me re dijwarîyên mezin dide derxistin. Ger ku em berseva vê pirsê bi rast û durustî bidin, divê li ser me, ku bi dûr û dirêj li mêjûwa Kurd û herwehajî li tevaya Mêjûwa Rojhilata Navîn ji xwe re bidin temaşekirin.

Berlin, di 21. 9. 1992 de

Dr. M. S. Gouma  
O1147 Berlin  
Müllerstr. 56

Tel. 030/ 5114680

Birayê hêja Ab-dul Rehman!

Ji mêj de min nameya te wergirt û ez pê pir kêfxweş bûm. Min pir dixwest, ku tu carekê bête Berlin ji bona serdana me.

Biraderan ji min re gotin, ku te Penahindabûna xwe ji xwe re date wergirtin. Bi rastî ez bi vê xebera hanê kêfxweş bûm. Ez hêvdarîim, ku dê rewşa û zîmeta jîna te bêtir bête başkirin. Ew bi xwe gelemekî mezin li pêşya te de bû. Tu niha dizane, bê ka serê te li ser çî balîfê de ye.

Ez gûman dikim, hinekî bala te jî hate safkirin û tu dikare ji xwe re ji bona wî Bajarî here, yê ku ew bi te xweş tête dîtîn.

Kar û bar di nava Welatê me de weha bi başî nare serî. Pir kêmanîyên me têtin dîtîin. Ev kur û kmanîyên henê, tev de bi carekê ji nezanî û ne têngihîştina me têtin dîtîn.

Ger weha kar û bar li Kurdistanê de bête çûyîn, hêç gûman têde niye, ku ew dê bi ziyana Milet û Welatê me bête bidawîkirin.

Ligora bîr û bawerîya min Partîya me careke din mîna her car vê carê jî ew di tengîyeke pir mezin re tête derbaskirin. Ew tanî niha pir ji têngihîştina siyasî û rewş û zîmeta Welatî meyî pir dûre. Ew her û her nekarîna liberketina xwe ji xwe re û herwehaji ji tevaya Xelkên Kurdistanê re dide xuyanîkirin.

Ez hêvdarim, ku Partî dê bikaribe xwe ji vê tengaya hanê bide derxistin.; jiber tevaya siyaseta me ew bi xwe li ser guhê Gamasî de tête danîn û avakirin.

Birayê hêja!

Min nameyek Iro ligel nivîsandina vê nameya te ji bona Kak Ismet re date nivîsandin. Ez ji te re wêneyekî ji wê namê didim rêkirin; ji ber hin bîr û bawerî li wir jî de li ser çarekirina dijwarîyên Welatê me de hatine, ku ez dixwazim, tu jî agehdarî wan bête kirin.

Careke din ez hêvîya xweşîya we dixwazim. Pir silavên Berbera û Ciwan ji bona we hene. Ez hêvdarîim, ku em dê di demeke kurt de hev bibînin. Hûn xweş!

Birayê te

*S. alih*

Berlin, di 14. 8. 1995 de

Dr.M. S. Gouma  
12623 Berlin  
Müllerstr. 56

Tel/Fax: 30/ 5662186

Ji bona Birayê hêja Ulan!

Ez ji bona te van nivîstan li ser çar diskêtan de didim rêkirin, bi hêvîya ku belkî hûn ji xwe re ji wan bikaribin bidin karkirin û hêjî bêtir belkî hûn bixwazin yanjî bikaribin wan bidin çapkirin. Mîna ku min ji te re dayite gotin: hûn dikarin wan ji bona yek carê bidin bidin çapkirin, bi mercekî ku hûn tu guhertin yanjî veguhertinan di nava şewê nivisandina wan de nedin kirin.

Ez dikarin wan hemûwan bidim çapkirin; lêbelê ez vî karê hanê di hustê xwe de nadim dîtin. Karê min bes û bi tenha ve di vî warî de tête dîtin, ku ez her û her bi zimanê meyî şêrin û perest bidin nivîsandin. Karê çapkirinê û belavkirinê ez wan di hustê xanîyên çapkirinê û belavkirinê de didim dîtin..

Di nava Diska 1:

- Buch4.doc: Nivîsta Bilêc Şêrkoh (Celadet Berdixan) tête dîtin
  - caren.doc: Nivîsta Lenin li ser Çarenûsa Netewan de tête dîtin.
  - hes. doc: Nivîsta Hesretyan li ser Kurdîstana Turkî de tête dîtin.
  - Ismet.doc: Nivîsta Ismet derbarê Sitraticîya Kurd de tête dîtin.
- Ev ji bona çapê hatine amadekirin.

Di nava Diska 2:

M 1-18.doc: Nivîsta Bergê Duwem ji Mêjûwa Kurd û Kirdistan ji bal M. A. Zekî Beg tête dîtin. Ev ji bal min hatiye dawîkirin; belam ew hêjî ji bal Kak Fewzî nehatiye rastkirin; jîbervêjî ew hêjî nala Destnivîsekê tête dîtin. Min ew bes û bi tenha ve ji bon aghdariyê ji bon te dayite rêkirin. Çi gava ku Kak Fewzî ew date rastkirin, dê ezê wê ji te re bidim rêkirin.

Di nava Diska 3:

Vanli. doc: Ew Deryê yekeme ji Pêşgotina Ismet Şerif Vanlî ji bona mêjûwa Zekî Bege Ismet 2-11: Ew ji Deriyên Ismet Şerif Vanli ji bona mêjûwa Zekî Beg têtin dîtin. Ew herdu yek nivîstin.

Ev Nivîsta hanê hêjî nehatiye dawîkirin. Ji wê çend rûpel hêjî nehatine wergerandin û hêjî ew ji bal Kak Fewzî nehatiye rastkirin. Çi gava ku ew hate dawî û rastkirin, dê ezê wê careke din ji bona te bidim şandin.

- Moh.doc: Ew Nivîsta Minoriskîye. : Kurd Nevîyên Midya.

Di nava Diska 4:

- M0-8. doc: Bergê Yekem ji Mêjûwa Zekî Bege. Ew ji bona çapê hatiye amadekirin.
- cendgoten.doc: Pêşgotineke kurte. ew ji bal min ji bona Bergê I hatiye nivîsandin.

Biryê te

Berlin, di 9. Januar 1995 de

Birayê hêja Huşyar!

Li ser pêşneyara te ji bona nivîsandina nameyekê ji bona kak Mesud li ser rewş û zînetên nihayî Kurdistanê Jêrîn, berên pêşkevtina wan û encamên wan de ez pir tede hatin remankirin. Min ji xwe date pirsîn: magelo mebest ji nivîsandina van nameyan û armanca wan çi tete dîtin? Ez rewş û Zînetan û berên pêşkevtina wan li gora zanebûn û bextê xwe de ji bona Kak Mesud li ser bîngêhê têgihîştina xwe de didim lêvenerandin û lêkolandin û li ber destên wî de didim danîn, da ku ew belkî piçekî sûd ji xwe re ji wan bikaribe bide wergirtin. Di nava van lêvenerandin û lêkolandinên Zanistî de Dostanî û Dilxweşîkirin têtin hilanîn; ji ber ku divê li lêvenerandin û lêkolandinên Zanistîyê de daxwaz, dildarî û dostanî bêtin dîrkin, da ku Merov xwe bi rastîyê ve bide gihastin yanî xwe jê bide nêzîkkirin. Ji ber dostanîya min jê re, evindariya min ji bona Partî û Miletê me min li ser xwe de dida dîtin, ku ez rast û durust bîr û bawerîyên xwe jê re bidim nivîsandin. Belam wer tete diyarkirin, ku Kak Mesud xwe bi pêwsitî van lêvenerandin û lêkolandinên mêjûyîyî Zanistî ve nade dîtin; ji ber ku ew him tirş û talin û himjî ew ne li gora dilê wî de têtin nivîsandin û têtin derkevtin.

Li vêderê de Du Rêyên mejûyî ji bona agehdariya Serdaran li ser rewş û zînetên Dorhêla wan de têtin dîtin:

1. Rêya Çînî tete dîtin, ya ku ew dibêjê: Serdar pir başe, belam Dorhêla wî û Karmendên Jêrdarên wîna nebaşin. Bi vî rengî ve Şehreza dixwaze kêrê li ser Serdar bide kirin û bi kêmtirîn û nermtirîn rexne ve ji bo wî zînet û rewşan bide çakkirin.
2. Rêya Yunanî tete dîtin, ya ku ew rep û rast rexne li Serdar de dide girtin û wî xweser ji bona bedbûna rewş û zînetan dide berpirsiyarîkirin.

Di Mêjûwa rexnegîriyê de di Kurdistanê de Xanî Rêya rexnegîriya Yunanî ji bona bedbûna rewş û zînetan di nava Kurdistanê de xweser ji bona Mîr û Maqulên Kurdistanê û ne ji bona Hejar û Perîşanên Kurdistanê dayite bikaranîn. Herwehajî bi vî rengî jî ve Mikavilî di Sedsalen Şanzdehan de ji bona Dostê xweyî Doqê Filorens, yê ku wî jê re Nivîsta Mîr date pêkşekirin, bi hêviya ku ew Italya bide rizgarkirin û biyekkirin, tevaya rexnegîriya xwe li ser wî de date girêdan. Bi vî rengî ve wî Doqê Filorensîyî Dostê xwe date neçarkirin, ku ew fermana birîna serê wî bide derxistin. Wer bi vî rengê hanê ve Mikavilî bi lez û bez ve serê xwe ji birîne date rizgarkirin. Herwehajî Reyhanîyê Feylesuf û Zanîstvanê bi nav û bang ve di rexnegîriya xwe de ji bona Padîşahê Mehmudê Xeznevî bi lez û bez ve û bes bi tenha ve ew ji serbirîna xwe hate rizgarkirin; ji ber ku di dema rexnegîriya wî de Padîşahê Mehmudê Xeznevî xwe di ber xirîna mirîne de dida dîtin.

Min nameya xweyî 23. Gulana Sala 1994 de li ser rewş û zînetên Kurdistanê jêrîn de li ser rêya rexnegîriya Yunanî de dayite nivîsanadin. Te ev rastîya hanê bi eşkere û diyar ve di nava Heşt Têşên wê de dayite dîtin. Dibe, ku jîbervêjî pir kêr yajî bêtir kêfa te ji şeweyê nivîsandina wê re hatiye dîtin; ji ber bi vî rengê hanê ve rast û durust Merov dikare di cewhara Pirsan de bête gihastin û wan bi başî ve jî bide çarekirin. Pirsan ku niha divê ez ji xwe bidim kirin, magelo Kak Mesud weha bi wî rengî ve li ber wan remanên min de tete kevtin? Ez naxwazim dilê wî bidim hiştin û neji ez dixwazim wî bidim tûrekin; belam ez dixwazim bes û bi tenha ve li gora zanebûn û bextê xwe û Dostanîya min jê re tevaya bîr û bawerîya xwe bidim derxistin û gotin, lê gava ku ew van bîr û bawerîyan nikaribe bide hilgirtin, divê ku ez bi remanên wê nameya xweyî mêjûyî ve jê re bidim têrkin. Mina ku Fîrensî didin gotin: Bihêl, bera bête derbaskirin.

Tevlivêjî bi rastî ve ez ji dil û can dixwazim bîr û bawerîyên xwe, dîtinên xwe li ser rewş û zînetên Kurdistanê, berên wan û encamên wan de ligel te de bidim giftûgorin.